
Kurdistan
PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
Çirya Pêşîn / 1 5- 10 - 2021
Kurdistan-Hejmar (207)
www.pdk-s.com

# Divê ENKS çalakiyên aştiyane li dijî kiryarên PYD berdewam bike

Kurdistan **Îsa Xelîl**




Di dawî çalakiyên Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS li bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê, dengekî mezin veda, xelekî zêde li dora ENKS hebû ku daxwaza serbestberdana girtiyan û erzankirina nirxê sotemniyê li deverên Kurdî dikirin.Cemîl Mûsa wiha dibêje, divê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS çalakiyên xwe zêde bike, û raneweste heta ku ev kiryar werin rawestandin,ji berku Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD tenê bi vî zimanê fêm dike, û ew ti carî danpêdanê bi danûstandinan nake, û xwe ji giftûgoyan direvîne. PYD ji hêza gel ditirse, û xelkê jî isbat kir ku ew ji ti aliyekî natirse. Beşar Hesen wiha dibêje, ENKS xwedan cemawerekî mezin, û ev cemawer deli pişta ENKS be, lewma divê ENKS daxwazên cemawerên xwe bicih bike,û xwe ji meydanê nede aliyekî û xelkê xwe bi tenê di dev gur de nehêle, û tekez Encûmen dev ji heval û alîgirên xwe ti carî bernade.

# Hebûna PKK hinceta Tirkiyê ye ji bo dagîrkirina bajarên me









Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bang li civaka navdewletî dike, grûpên çekdaran ji Serê Kaniyê û Girê Sipî derbixin û rê ji bo vegera koçberan xweş bikin. Sekreteriya Giştî ya ENKSê îro daxuyaniyek di salvegera êrîşa artêşa Tirkiyê û grûpên çekdarên ên opozîsyona Sûriyê li ser herêmên Serê Kaniyê û Girê Sipî yên Kurdistana Sûriyê de belav kir. Sekreteriya Giştî ya ENKSê di daxuyaniya xwe de ragihand, artêşa Tirkiyê bi bihaneya parastina ewlehiya xwe ya netewî ji PKKê, êrîşî ser Serê Kaniyê û Girê Sipî kir. Bi vê êrîşa Tirkiyê re, grûpên çekdar ên opozîsyona Sûriyê jî êrîş kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin: Ji ber operasyonên leşkerî, bi dehan xelkê herêmê ji hemû pêkhateyan, neçar bûm koçber bibin. Ew di heyama du salên borî de jî di rewşeke xirap de dimînin. ENKSê tekez kir, grûpên çekdaran binpêkirinên herî hovane li dijî sivîlan kirin, ji dizî û talankirina mal û milkên wan û heta cihên şûnwarî û perestgehan. Herwiha gelek welatiyên Kurd ên di malên xwe de man jî revandin û dan bin eşkencedanê ku vê yekê jî hîşt ewên mane jî koçber bibin. ENKS dibêje, tevî nerazîbûn û şermezarkirina rêxistinên mirovî, navdewletî û Kurdî ji van binpêkirinan re, lê ew binpêkirin nehatin rawestandin û ne dewleta Tirkiyê û ne civaka navdewletî, rê li ber wan binpêkirinan girtin.Herwiha ENKS di daxuyaniya xwe de diyar kir, “Rapora Komîta Lêkolînê ya Navdewletî ew û binpêkirinên ji aliyên Artêşa Niştimanî ya Sûrî ve li herêmên Kurdî hatine kirin, wekî tawanên şer bi nav kirin.” Di daxuyaniyê de hat gotin: “ENKS di salvegera duyemîn a vê êrîşê de, tawan û binpêkirinên li ser xelkê Serê Kaniyê û Girê Sipî hatine kirin, bi tundî şermezar dike û bang li civaka navdewletî û dewletên pêwendîdar bi dosyaya Sûriyê û di serî de Amerîka, Rûsya û Tirkiyê dike, grûpên çekdaran ji herêmê derbixin, rê ji bo vegera koçberan xweş bikin, rêveberiya wan herêman radestî xelkê wê bikin û tawanbaran bidin dadgehan.”

Mihemed Omran wiha li ser vê mijarê dibêje, birastî bajarê PKK lê hebe dê rastî karesatan were,û dê were dagîrkirin, wek çawali Efrîn û Serêkaniyê û Girêsipî, herwiha hin deverên li Herêma Kurdistanê, hebûna vê partiyê li her deverekê dibe hincet ji bo Tirkiyê da ku dever û navçeyên me dagîr bike û em vê yekê jî bi çavê xwe dibînnin, bi rastî heger sînorek ji vê partiyêre neyê danîn dê zirareke mezin bighê Kurdan li her çar perçeyên Kurdistanê, û dê rastî êrîşên dagîrkeran werin, ev partî xizmeta dijminê gelê Kurdistanê dike û ti carî di berjewendiya Kurdan de kar nekiriye,lewma divê kareke cidî were kirin heta ku kiryarên vê partiyê werin rawestandin û rê li ber were girtin heraku nikaribe ti kiryareke din derheqê xelkê me de bike û bi taybet li Kurdistana Sûriyê .

Telal Ehmed jî li ser vê mijarê wiha dibêje, heger em bala xwe bidnê, emê bibînin ketina hemî wan bajarên Kurdê li Kurdistana Sûriyê ji ber kiryarên PKK bûye, lewma divê karekî niştîmanî werekirin, û Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di vê derbarê de bixebite, û gavên baş bavêje û xelkê me ji kiryarên nehênî yên vê partiyê agahdar bike, heta ku milet bi rêya şaş ya vê partiyê neçin.

Fêsel Qadir jî wiha li ser vê yekê dibêje, binpêkirin li Serêkaniyê û Efrîn û Girê Spî têne kirin, û divê civaka navdewletî di vê derbarê de karekî bike, û binpêkirinên derheqê miletê me rawestîne, û bê dengiya xwe beramber binpêkirinan nehêle, herwiha divê rêxistinên civaka sivîl jî bêhtir kar ji bo van deveran bikin.

# Ava me qut dikin, petrola me ji wan re diçe

**Kurdistan**










**Netewên Yekgirtî daxwaza komkirina 251 milyon Dolar ji bo çareserkirina pirsgirêka kêmbûna avê li Rojavayê Kurdistanê û bakurê û rojhilatê Sûriyê dike.**

**Berdevkê Sekreterê Giştî yê Netewên Yekgirtî Stephane Dujarric li New Yorkê di konferanseke rojnamevanî de ragihand, 5 milyon kes li Kurdistana Sûriyê û bakur û bakurê rojêhilatê Sûriyê rastî krîza kêmbûna avê hatine, divê ev pirsgirêk di zûtirîn dem de were çareserkirin.**

**Got jî, ji ber kêmbûna asta avê û têkçûna westgehên pompekirina avê, av bi awayekî têr û temam nagihe hemû xelkê herêmên bakurê Sûriyê.**

**Herwiha got: "Kêmbûna ava vexwarinê ya pak, dibe sedema belavbûna nexweşiyên û rêza yekem a rûbirûbûna Koronayê kêm dike." Destnîşan kir jî: "Kêmbûna elektirîkê jî bandor li sektora tendirustî û perwerdehiyê kiriye."**

**Dujarric ji bo çareserkirina krîza kêmbûna avê, daxwaza komkirina 251 milyon Dolaran kirine, lê heta niha tenê 51 milyon Dolar hatine dabînkirin.**

**Diyar kir jî, Neteweyên Yekgirtî bi hevalbendên xwe re, pilanek ji bo şeş mehên bê ji bo alîkariya 3.4 mîlyon kesên ku li wan deveran herî zêde bandor li wan bûye, daye destpêkirin.**

**Ava vexwarinê ya Bajarê Hesekê û deverên derdora wê, ji wêstgeha Elok ya li Serê Kaniyê ye, komên çekdar ên ser bi Tirkiyê ji dema Serê Kaniyê dagîr kirine, dest danîn ser wê wêstgehê û niha weke çekekî li dijî welatiyên li deverê bi kar tînin û avê dibirin.**

**Bi kêmbûna avê re,gelek kêşeyên din rû didin ,nemaze ku vayrosa Korona li deverê belav bûye û pêwîstî bi paqijiyê bêtir heye, û dema ku xelk jî ava bîran bikar tînin, nexweşiyên din mîna zikêş û jehriyê derdikevin, beriya heftiyekê,bi hezran haletên jehiriyê li nexweşxaneyên Hesekê û Qamişlo hatibûn tomar kirin.**

**Li ser mijar û pirsgirêka avê li Kurdistana Sûriyê rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan wergirt.**

**Fûad Ebdulhekîm wiha di vê derbarê de got,rewşa xizmetguzariyan bi giştî li Kurdistana Sûriyê gelekî xerab e û bi taybet rewşa avê ku niha li Hesekê av tine, û sedema wê jî qutkirina ava wêstgeha Elok li Serêkaniyê ye ji aliyê grûpên çekdar ve,lewma divê civaka navdewletî û dewletên zulhêz vê tawana dijî mirovahiyê rawestînin heta ku xelkê van deveran aveke paqij bidest bixin,û ava gemar ji nav wan biçe, û êdî jiyaneke xweş bê pirsgirêk derbas bikin, û ava paqij ji wan re were dabîn kirin,û ji nexweşî û êş û azaran dûr bikevin,xelkên Kurdistana Sûriyê hêjayî jiyaneke xweş in ku dûr ji pirsgirêkan.**

**Ciwan Îmad jî wiha got, ya giring di dema niha de ava paqij bighê xelkê Hesekê,û ev mijar neyê dirêjkirin ji ber ku rastî bazirganî bi pirsê dikin,ji ber ku niha bi rastî bazirganî bi mijara ava Hesekê tê kirin, elikitrîkli ser Serêkaniyê tê qutkirin di beramber de jî av li Hesekê û Tiltemirê tê qutkirin, herwiha carcaran behsa rêkeftinan tê kirin,herwiha destêwerdana Rûsiya di vê pirsê de,ev hemû jî xelkê sivîl baca vê yekê didin lewma divê karekî cidî ji vê pirsa mezin û karesatê re were danîn heta ku xelk ava paqij bidest bixin.**

**Cuma jî wiha dibêje, herkes dizane ku petrol û sotemenî bi qaçaxî derbasî Serêkaniyê û Girêspî dibe, di demekê de ku grûpên çekdar avê li ser xelkê me li Hesekê û Tiltemir qut dikin,gelo ev yek tê wateya çi,çima ev yek tê kirin ev hemû jî berjewendiyên aliyan e, û ti aliyek berjewendiya miletême li ber çavê xwe nagire, gelo wê kengî ev alî berjewendiyên xelkê xwe bixne pêşiya berjewendiyên partîtî, ev bazirganiyê bi xelkê dikin û pirsa avê jî bi siyasî hatiye kirin, lewma divê sînorek ji vê yekê re were danîn.**



# Serkeftina Partiya Demokrata Kurdistanê gavek berev serxwebûnê ve ye

**Kurdistan**



Bi helkefta serkeftina Partiya Dêmoqrata Kurdistanê di hilbijartinên perlemana Îraqê de, Komîta Navendî ya Partiya Demoqrata Kurdistan – Sûriya duh 12ê Cotmeha 2021ê nameyek pîrozbahiyê arastî serok Mesûd Barzanî û PDKê kir.
PDK-Sê di nameya xwe de gotiye: Cihê dilxweşî û kêfxwşiyê ye ku em di Komîta Navendî ya Partiya Demoqrata Kurdistan – Sûriya de, bi helkefta serkeftina we ya mezin di hilbijartinên Îraqî de, di rêya cenabê we re, pîrozbahiyên germ arastî hemû, endam, alîgir û cemawerê partiya we ya bira bikin, ku pileya yekemîn li ser asta Kurdistanê bi dest xwe ve xist, û ji berê bêtir danişţek (Kursî) anîn, ev yek tekeziyeke ku roj bi roj cemawerê partiya we ya dêrîn di tekoşînê de zêde dibe, û erk e li ser milê xwe dibîne ku hilgirê ala netewî ya kurdî ye, û bawerpêkiriyê li ser rola dîrokî ya kevin e, û baştirîn nûner û dirêjpêderê prensîpên serokê damezrînerê bavê nemir Mela Mustefa Barzanî ye.
Di nameyê de hatiye: Serokê rêzdar... Birayên birêz: Partiya Kurdistanî bi vîneke mezin di hilbijartinan de beşdar kir, hemû kadirên partî di proseya hilbijartinan de amede bûn, û çavên wan li serkeftina bi hejmarek mezin ji kursiyan bû, ji ber ku serkeftina nûnerên Partî li Bexdayê wate serkeftina tevaya kurdan e û serkeftin û bihêzbûna helwêsta kurdî di derbarê çendîn dozên çarenivîsî ne ku ta niha navbera Hewlêr û Bexdayê de nehatine çareserkirin weke gelek dozên girîng girêdayî bi hebûna kurdan û pêşeroja herêma Kurdistanê ne, herweha hin mijar û babetên di warê bijêwa şêniyên herêma Kurdistanê de ne.
PDK-Sê ragihandiye: Em di wê baweriyê de ne ku bihêzbûna Partî di perlemana Îraqî de, wate rûmeta Kurdistaniyan dê parastî be, û rêzgirtin ji kesayetiya kurdî re dê ji karên pêşîn yên Partî be, ev serkeftin dê bihêle ku bibe aliyeke girîng di damezrandina hikûmeta Îraqî ya bê de, em di wê baweriyê de ne ku encama serkeftinê ji dêrîniya dîroka partiya we, ji damezrandinê ta bi 7 sedsaliya xebat û tekoşînê hatiye. Serokê rêzdar... Birayên hêja: Encamên ku em hemû kêfxweş kirine, bihêzbûna vîna serkirdayetiya Partî, endam û cemawerê dilsoz ji buhayên kurdayetiyê re diyar kirin, ev vîn jî nûneratiya vegera bihêz ya Partî û alîgirên wê bo Kerkûk û Şengalê, û vegerandina baweriyê bi nêzîkbûna rêzgariyê û vegera bo hembêza Kurdistanê ji nû ve dike, û şûnên xiyaneta 16 Cotmehê ji nav bibe, serkeftina Partî wate serkeftina giştpirsiya Kurdistanê ye, ku berê û niha jî gaveke ber bi serxwebûna Kurdistanê ve ye.
PDK-Sê di nameya xwe de gotiye: Serkeftina Partiya Dîmoqratî Kurdistan, weke serok Mesûd Barzanî di nameya xwe ya pîrozkirinê de gotiye wate: Serkeftina prensîp û buhayên bingeha tekoşîna gelê Kurdistanê ye, herweha serkeftina wê nameyeke bo hemû aliyan e ku gelê Kurdistanê tu carî û çi demî dest ji dîrok û presîpên xwe bernade.
Di dawiya nameya xwe de, PDK-Sê careke din pîrozbahî bi serkeftina mezin kir û hêviya serkeftinê bo doza kurd û Kurdistanê xwest.

# Keda xebatkar Osman Sebrî nayê jibîrkirin

**Kurdistan-Bidûvçûn**

Xebatkar û helbestvan û siyasetmedarê Kurd Osman Sebrî beriya 28 salan ji nav me bar kir. Osman Sebrî jiyaneke zehmet û tije dijwarî û koçberî û girtin û îşkence derbas kir.
Osman kurê Serokeşîrê Mirdêsan Sebrî Axa bû û di 5ê Çileya 1905an de li gundê Narincê yê Kolika Semsûrê jidayîk bûbû.
Gava ew 10 salî bû, bavê wî çû rehmetê û ew ji aliyê apê xwe Şukrî ve hat mezinkirin.
Osman Sebrî di sala 1929an de derbasî Binxetê bû û çû Kobanê, cem Mala Hirço Begê. Vê bûyerê li herêmê deng veda û gelek dengbêjan kilam li ser wî gotin.
Osman Sebrî li Sûriyê jî bi sedema karên siyasî, sirgûnî Urdun, Fîlîstîn û Madagaskarê bû. Di tevahiya jiyana xwe de 12 salan di zindanê de ma û rewşa wî ya aborî xirab bû.
Lê Osman Sebrî wek hîm û tehtên Kurdistanê berxwedêr û serhişk bû. Ew qet li pêşiya dijwariyan neçemiya û her û her kar û xebata xwe ya siyasî û edebî domand.
Bi taybetî xizmeteke berçav di kovara Hawarê de kir û gelek berhemên giranbuha li pey xwe hîştin wek: Bahoz, Derdên Me, Çar Leheng, Dîwan, Bîranîn, Elifbeya Têkû, Bersiva Hoşeng û hin berhemên din.
Osman Sebrî di 11ê Cotmeha 1993an koça dawî kir û gora wî li Binxetê, li nêzîkî gundê Berkevirê yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê ye.



# Hizniyê Selîm parêzvanê stranên folklorî bû

**Ezîz Xemcivîn**

Hizniyê Selîm, hunermendê folklor ko di dema xwe de pir bi nav û deng bû, bi kedeke pir mezin û liberxwedaneke civakî bi sûr bû ko bistirê û redkirina malbat û eşîrê, bi serhişkiya xwe çiqas astengî dîtinê lê çi hêzê ew ji rêya hunerê neda paş..
Bandora hunermendê folklor pakrewan Ûsivê Çelebî li ser Hiznî hebû, lê Hiznî di hevpeyivîneke xwe de digel Ekrem Derwêş sala 1992 dibêje: ko mamostayê wî Mihemed Eliyê Simê bû.. Hiznîyê Selîm ew jî hîmekî mezin di strana wê serdemê de bû..
Bi dîtina min eger ne ji Hiznî ba, piraniya stranên Ûsivê Çelebî wê winda bibana. Sedemên evê xalê ko Ûsivê Çelebî di ciwaniya xwe de bi destê rêjîma Sûriyê wê hingê hatiye kuştin û piraniya stranên wî bi dengê wî ne hatine tomarkirin..
Têbîniya din jî û ev gelekî giring e, min li çend hevpeyivînên Şefîqo guhdarî kiriye, Şefîqo hewil dide rola Hiznî û hunera wî tune bike û xwe dike şûna wî, lê li gora pêzanînan û rasteqîna mijarê ko dema Hiznî li ahengan distira Şefîqo di temenekî piçûk de bû û di ber re navtêdan dikir û ditewand!
Lê ez bawer nakim tucaran Roj bi seradê bête veşartin û yên wek Şefîqo heta Hiznî û kurê wî hunermend Adil sax bûn nikarî bû yek ji van helwestên çewt û nedirist bida..

